

Nameya Mafan ji bo kesên ji ber Qanûna Terorê ya 2000ê hatine binçavkirin

Ev broşûr li ser mafên te yê li gorî qanûnên li Skotlendê yê dema tu li navenda polîsan di bin çavan de bî, agahiyên giring dide. Ev belge ji te re behsa mafên te yê bingehîn yê dema binçavkirinê dike. Ev ne şertên qanûnî ne û behsa hemû mafên te nake. Divê tu li şertên xwe yê qanûnî yê serbixwe bigerî.

Tika ye vê agahiyê di dema herî nêzik de bixwîne. Dema tu li navenda polîsan bî ev ê ji bo biryarên te bibe alîkar. Tika ye hemû tişten vê broşûrê yê tu fêm nakî ji polîsan bipirse ku ji te re rave bikin an jî kopiyeke hêsankirî yan jî wergerandî bidin te.

Mafên xwe bizane:

- Mafê te heye ku tu bizanî ka polîs çima te radigirin.
- Mafê te heye ku ji parêzerekî re bibêjî tu li navenda polîsan têyî ragirtin. Ev belge.
- Mafê te heye ku tu kesekî din ê meraqa te dike derbarê girtina xwe de agahdar bikî. Wek mînak, dibê ku ev endamekî malbatê, nihêrvan an jî hevaleyek be.
- Mafê te heye ku tu bêdeng bimînî. Tu ne mecbûr î pirsên polîsan bibersivînî. Lê tu mecbûr î navê xwe, navnîşana xwe, roja jidayikbûna xwe, ciyê jidayikbûna xwe û welatîbûna xwe bibêjî.
- Mafê te heye ku beriya polîs ji te pirsan bike tu bi parêzerekî re bi awayê taybet bêyî hebûna polîsan biaxivî. Her wisa gava polîs ji te pirsan bikin, tu dikarî gava bixwazî bi parêzer re biaxivî.
- Heke tu ji 16 salî biçûktir î yan jî ji 18 alî biçûktir î û di bin fermaneke çavdêriyê ya demkî de yî, dîsa jî mafê te heye ku dêûbavê te yan jî parêzvanê te ji bo serdana te werin navenda polîsan.
- Mafê te heye ku tu alîkariya tibî ya lezgîn wergirî.
- Mafê te heye ku tu li ser awayê muameleya polîsan ya bi te hatî kirin gilî bikî.

Mafên te

Tika ye ji bîr neke: Di hin rewşên istisnayî de polîs dikarin hin ji van mafên te bixin derengiyê yan jî asteng bikin. Wek mînak, heke polîs di wê baweriyê de be ku axaftina bi te re dê rê li zirardîtina kesekî din bigire. Mafê te yê bêdengmanê nakeve nav vê.

1. Agahiyên ji bo kesên ji aliyê polîsan ve hatine binçavkirin

- Zanîna sedema girtin û binçavkirinê

Divê polîs agahiyên bidin te ku tu fêhm bikî ka tu çima hatiyê girtin û çima gumana wan ji te heye ku tu di nav komekê de bûyî ku amadekarî yan jî teşwîqa terorê dike.

Li navenda polîsan divê polîs ji te re bibêjin ka çima ew bawer dikin ku pêwîst e tu bêtir ragirtin. Beriya ku polîs derbarê gumana beşdariya te ya nav terorê de ji te pirsan bike, divê polîs agahiyên têr bide te yan jî parêzerê te ka ew difikirin te çi kiriye, da ku tu bikaribî bêtir zirarê bidî lêpîrsîna polîsan xwe biparêzî.

- Mafê bêdengbûnê

Tu ne mecbûr î pirsên polîsan yê te sêdar dikin bibersivînî.

Hemû tişten tu bibêjî dê bînin nivîsandin yan qeydînin û heke doz here mehkemeyê, dibe ku ev li mehkemeyê wekî delîl bînin bikaranînin.

Gava polîs ji te bipirsin, divê tu navê xwe, navnîsa xwe, roja jidayikbûna xwe, cîyê jidayikbûna xwe û welatîbûna xwe bibêjî.

- Agahdarkirina parêzerekî

Tu dikarî ji polîsan bixwazî ku ji parêzerekî re bibêjin tu li navenda polîsan têtir ragirtin. Ev dikare parêzerê te bixwe be, heke parêzerekî nas nakî, dibe ku ev parêzerekî peywardarkirî be. Polîs wê bike ku di dema herî nêzik de bi parêzerekî re peywendî bînin. Ev bêtir ye.

Agahdarkirina kesekî din ê meraqa te dike derbarê girtina te de.

Tu dikarî ji polîsan bixwazî ku ji kesekî din re bibêjin tu li navenda polîsan têtir ragirtin. Ev dikare kesekî ji malbata te, hevjinê/a te, nihêrvanê/a te, hevalekê/î te yan jî kesekî din be. Ew ê heta ji destê wan tê zû kesekî din agahdar bikin.

Heke tu ji 16 salî biçûktir î (yan jî ji 18 salî biçûktir î û di bin fermaneke çavdêriyê ya demkî de yî)

- Divê polîs hewl bidin ku dêubavê te yan jî parêzvana te agahdar bikin ku tu li navenda polîsan î.
- Dêubavê te yan jî parêzvana/ê te dikarin werin navenda polîsan û pişgiriya te bikin.

- Anîna wergêrekî devkî ji bo alîkariya te

Heke tu nikarî bi inglîzî biaxivî yan jî fêhm nakî, polîs dê ji bo alîkariya te yekî bi zimanê te diaxive (wergêrekî devkî) bîne. Ev belavê. Giring e ku tu fêhm bikî ka li midûriyeta polîsan çî tê gotin.

Heke guhên te kerr bin an jî di peywendîdanînê de zehmetiyên te hebin, polîs dê kesekî ji bo alîkariya te peyda bikin. Dibe ku ev wergêrekî Zimanê Înglîzî ya Brîtanî yan jî pisporekî din ê tîkildar be. Ev belavê.

- Heke tu ne brîtanî yî

Heke tu ne brîtanî yî, tu dikarî ji polîsan bixwazî ku ji Komîseriya Bilind, Balyozxane yan Konsulxaneyê te re bibêjin ka tu li ku derê û çima li navenda polîsan î. Ew jî dikarin bi awayê taybet serdana te bikin û ji bo dîtina te parêzerekî peyda bikin.

- Heke doz li te bê vekirin wê çî bibe?

Heke ji ber sûcekî doz li te bê vekirin, dibe ku te ji binçavan derxin an jî tu li navenda polîsan bêyî girtin û roja paşî a guncav te bibin mehkemeyê. Yan jî heke tu qebûl bikî ku rojêke diyarkirî herî mehkemeyê, dibe ku tu bêyî berdana.

- Xwegihandina belgeyan

Heke doza te biçe mehkemeyê, ew ê noteke delîlên dozê bidin te yan jî bidin parêzerê te. Ev ê ji bo parastinê alîkariya te û parêzerê te bike.

Heke tu inglîzî fêhm nakî, mafê te heye ku wergera beşî tîkildar bidin te.

- Xwegihandina alîkariya tibî

Polîs dê li ser tenduristî û bawerîya te pirsan ji te bikin. Heke rewşê te ya tibî hebe yan jî dermanan bi kar tînin, giring e ku vê ji polîsan re bibêjî. Her wisa heke tu bengiyê alkolê yan jî tiryakê bî yan jî difikirî ku zirarê bidî xwe, giring e ku polîsan agahdar bikî.

Dibe ku polîs ji bijîşkekî bixwazin ku te muayene bike. Ev ji bo alîkariya hindê ye ku piştî bibin di binçavan de birêkûpêk hay ji te mane. Heke tu his dikî pêdiviya te bi bijîşkekê heye, vê ji polîsan re bibêje.

Heke tu nexweşî, mafê te yê alîkariya tibî heye.

- Xwarin û vexwarin

Av dê li ser daxwazê ji bo te bê dabînkirin. Heke tu ji heyameke çar saetan zêdetir di binçavan de bî ew ê xwarinekê pêşîyarî te bikin. Heke divê xwarina te li gorî diyetekê yan jî dînekî/baweriyekê be, polîsan zû ji vê agahdar bike.

- Gilîkirin

Heke tu bixwazî dema binçavkirinê giliyekê bikî, bi mifetîskî re yan jî bi yekî payebilindtir re biaxive. Heke tu dixwazî piştî berdana xwe gilî bikî, tu dikarî herî midûriyeteke polîsan an jî telefonî hejmara 101ê bikî. Heke te destûra nivîskî dabe, her wisa tu dikarî ji kesekî din bixwazî ku li ser navê te gilî bike. Ev dikare hevjin, hevlek yan jî kesekî din be ku baweriyê te pê tê.

Heke tu di dema girtinê de yan jî di binçavan de ji aliyê polîsekî ve hatibî êşandin an jî te zirar dîtibe pêwîst e tu giliyê xwe li ba Dezgeha Standardên Pîşî ya Skotlendê bikî.

Heke pêdiviya te bi piştgiriya zêdetir hebe (tika ye ji bîr neke ku ev agahiyên li ser xizmetekê ne, ne ku maf in):

Dibe ku ji te re alîkarî bivê ku tu fêhm bikî ka dema tu li midûriyeta polîsan î çî diqewime. Dibe ku ev alîkarî ji aliyê kesê alîkar yê dibêjinê Salmezinê Maqûl ve bê dayîn. Heke nerehetiyê te ya ji mejî yan jî zehmetiyên te yê fêrbûnê hebin, dibe ku ev ji bo te bê pêkanîn. Heke tu difikirî ji te re alîkarî divê, vê ji polîsan re bibêje.

Heke polîs bifikirin ku ji te re alîkariya Salmezinekî Maqûl divê, heke tu nepirsî jî ew ê bixwazin yek beşdar bibe.

2. Agahiyên ji bo kesên di lêpirsîna polîsan de

- Anîna parêzerekî ji bo alîkariya te

Heke tu parêzerekî dixwazî, vê ji polîsan re bibêje. Polîs dê di demeke zûtir de ji bo te bi parêzerekî re peywendî dayîne.

Karê parêzeran ev e ku mafên te biparêzin û derbarê qanûnan de şretan li te bikin.

Tu dikarî hilbijêrî ka bi parêzerekî naskirî re yan jî yekî peywardarkirî re biaxivî. Parêzerên peywardar serbixwe ne û ne ji polîsan re dixebitin.

Parêzer wê ji te re bibêje ka ew ê şretan bi belaşbîke yan jî heqê xwe ji te bistîne. Heke tu heqê wî bidî, ew ê ji te re bibêje ka tu yê çiqasî û çawa bidiyê. Polîs wê heqê parêzeriyê nede û li ser çawaniya dana heqê wî neaxive.

Destûra te heye ku ji bilî pirsên li ser ewlekariyê û yê lezgîn, beriya polîs ji te pirsan bikin, bi parêzer re taybet biaxivî.

Dema tu bixwazî tu dikarî fikrê xwe yê li ser axaftina bi parêzerekî re biguherîni. Di demeke zûtir de polîsan agahdar bike ku ji bo te bi parêzerekî re peywendî dayîne.

Heke parêzer di dema gotî de yan jî di dema ji te re pêwîst de nehatibe navenda polîsan, tu dikarî ji polîsan bixwazî ku dîsa pê re peywendî dayîne.

Ji bilî pirsên li ser ewlekariyê û yê lezgîn, mafê te heye ku dema polîs pirsan ji te bikin parêzerek li odeyê li ba te be.

- Dikarin çiqasî te li midûriyeta polîsan ragirin?

Polîs dikarin bêyî sûcdarkirinekê te heta 48 saetan ji bo lêpirsînê ragirin. Divê polîsekî payebilind gelek caran li dosyeya te binêre ka hê jî pêdivî bi ragirtina te heye yan na. Navê vê nirxandin e. Tenê heke mehkemeyek destûrê bide, dikarin te ji 48 saetan zêdetir ragirin. Mehkeme dikare bêyî vekirina dozekê dema te ya ragirtinê herî zêde ji girtina te heta 14 rojan dirêj bike. Di vê rewşê de divê van bidin te:

- Belgeyê nivîskî ya pêkanîna serlêdana dirêjkirina ragirtina te;
- Dema pêkanîna serlêdanê;
- Dema ku mehkeme dê serlêdanê binirxîne; û
- Sedema/ên daxwaza dirêjkirina ragirtinê.

Her ku dema ragirtina te bê dirêjkirin an jî hê bêtir bê dirêjkirin, pêwîst e agahdariyê bidin te (û temsîlkarê te yê qanûnî).

Heke ne bi dilê we be, mafê te û yê parêzerê te heye ku hûn li ser vê biryarê gotina xwe bibêjin. Parêzerek dikare derbarê vê de şretan bide te.

- Serdaneerên Serbixwe yê Binçavkirinê

Hin endamên civakê hene ku destûra wan heye bikevin navendên polîsan. Navê wan Serdaneerên Serbixwe yê Binçavkirinê ye û karê wan li ser bingeha dilxwaziyê ye û ev e ku teqez bikin kesên di binçavan de muameleyeke rast dibînin û digihîjin mafên xwe.

Mafê te tune ye ku tu Serdaneerê Serbixwe yê Binçavkirinê bibînî yan jî bixwazî ku werin dîtina te, lê serdaneer dikare bixwaze te bibîne. Heke di dema te ya binçavkirinê de Serdaneerê Serbixwe yê Binçavkirinê bê serdana te, ew ê ji bo kontrolkirina parastina aramiya te û mafên te ji polîsan cuda û serbixwe tevbigere. Tu dikarî biryar bidî ku pê re biaxivî yan jî neaxivî.